# PÎR ŞALYAR

**Jînîgariya Pîr Şalyar**:
Pîr Şalyar yan “Pîr Şehryar” li gor hin jêderkan navê wî “Xwedadadê kurê Camasp”e. Weku Pîr Şalyarê Hewramanê navdar e, ew yek ji pîrên herî mezin ê peyrewên dînê Yarsanî ye. Gor van agahî û çavkaniyên yek ji destnivîsên pirtûka “Serencam”ê di paja “Dewrên Şahxoşîn”ê de hatiye nivîsandin, Pîr Şalyar di 1006ê zayinê li Hewramanê zad bûye. Di dema ciwaniya xwe de berê xwe daye Loristanê û çûye bal Şahxoşînê, sê salan li wir maye û dûre li ser daxwaza Şahxoşînî vegeryaye Hewramanê û bangxwaziya bîr û baweriya Yarsaniyê kiriye. Di sala 1098 zayinî wefat kiriye.

**Wêjeya Pîr Şalyar**:
Zanayekî mezin bûye di zanistên “Hîkmet, Kelam û Mantiq”ê de. Gor hin kesatiyên Hewramanê Pîr Şalyar xwedî pirtûkeke bi navê “Marîfetû Pîrî yan Marîfetû Pîr Şalyar”ê, vê pirtûkê li bal Hewramiyan pîroz e û şanî kesî nadin û peyvên wê weku pend û şîretê bikartînin. Hin kes Pîr Şalyar weku Mugekî Zerdeştî didin nasîn.
Di çavkaniyeke edebiyata Yarsanî de mijarek bi navê Pîr Şalyar hatiye tomarkirin. Hûzanmend(şaîîr) di hûzan(şîîr)ê xwe de qala agirdankê de dike bi ruhekî Zerdeştiyane dibêje:

Ew ahirxane, ew ahirxane
Barge şam westen, ew ahirxane
Zerdeşteş kiyast, perî ferman e
Berguzîdeş kird, nerûy zemane

Di vê hûzan(şîîr) û şîîrên din ên Pîr Şalyar jî bi zelalî morka berê Musulnatiyê xuya dike, peyvên erebî û rehend û lêksîkon(tabîr)ên musulmantiyê bi ser wî de zal nebûye, ev jî belgeyekê dî ye ku dînê Îslamê dereng gihiştiye herêma

Hewramanê û belav bûye û birsiye.
*Têbînî: di nav xelkî de meşhûr e ku xelkên Hewramanê ta çaxa 13ê zayinê jî li ser dînên xwe yên Kurdîya kevnare bûne. Mela Guşayiş yan jî Guşayişê kor, kurê "Pîr Muhemedê Baba Merdoxî" yê Hewramî ye, ew di sala 1388 – 1468 zayinê jiyaye. ji ber ku çavê wî hinekî mijor bûye, lew jêre gotine "Guşayişê kor". Ew roleke mezin lîtiye ji belavbûna dînê Îslamê li herêma Hewramê de.*
Ji ber ku Pîr Şalyar berî cava 11ê zayinê jiyaye û xelkên Hewramanê hê nebibûn musulman, lew dibêjin: pirtûka "Marîfetû Pîr Şalyar" ji pirtûka "Quran"ê kevintir e.
Her ji van nimûneyên kêm ku di pirtûka "Marîfetû Pîr Şalyar"ê re maye, tê dîtin ku nêrîn û têbîniyên kûr ji hîkmet, felsefe, pend û şîretan di qalibên du beytan hatiye danîn, li gor wezina deh sîlabiyê dasaz e weku piraniya hûzan û şîîrên diyalekta Hewramiyê, li gor qafiyê jî hemû nîv beytan li ser yek qafiye ne, risteyên wê kurt û rewan in. Pîr Şalyar di pirtûka xwe de li paşî her du beytan, vê beyta hanê dubare dike:

"Goşt ce watey, Pîr Şalyar bo
Hoşt ce kiyastey, zanay sîmyar bo"

Hûzan û şîîrên Pîr Şalyar ku ta niha berdest in evên jêrîn in, goya di pirtûka "Dewrên Şahxoşîn"ê de hatine wergirtin.

1.
Yaran ce rêwas, yaran ce rêwas
Padşam peyda bî, ce daney rêwas
Meşye û Meşyane, beraman ce was
Perê azmayî, mêrdan rewash
2.
Werê wawe ro, werwe werêne
Werêse biryo, çiwar serêne
Kergê siyawe, hêllêş çermêne
Guşllê me mêryo, dûre berêne
3.
Daran giyan daren, cerg û dill bergen

Gayê pirr Bergen, gayê bê bergen
Kerge ce hêllên, hêllê ce kergen
Rewas ce rewash, wergê ce wergen

Van wênebeytan hin ji wan bûne peyvên nesteq di nav xelkî de, bi her hawî van îcatan di wêjeya Sofîzimê ve nêzîk in

**Cejna Pîr Şalyar**:
Cejn û ahenga Pîr Şalyar li Hewramanê vedigere demboriyeke dêrîn û dêrokî Kurd wê cejnê pir pîroz û giring dibînin û weku yek ji cejn û boneya Kurdîya kevnare dibînin. Her sal li Hewramana Text birêve diçe. Ahenga Pîr Şalyar ku Hewramiyan bi xwe jêre dibêjin: “Zemawenû Pîrî” du dem û du paj in anku nîvê zivistan û nîvê beharê.
1.di zivistanê de roja çarşemê ta roja înê didome, li gor salnameya Kurdî dikeve destpêka meha çileya mezin anku 1-2-3 meha 2ê anku rêbendanê(1ê sibat)ê destpê dike û 3 roj û 3 şev didome.
2.di beharê de 15ê gulanê de anku 5.5ê her sal vê cejn û ahengê bi navê cejna “Komasa yan Komsay”ê ye li kêleka gorra Pîr Şalyarê 3 roj û 3 şev birêve diçe, bi zîkir, lava, aheng û govendên, xwarin û vexwarin, şîrînî, gûz, mêweyên taybet û qûrbanî kirinê didome.
Di van 3 roj û 3 şevan de dab û nêrîtên dîrokî yên weku “Killaw roçne yan jî Killaw rojne”, qûrbanî kirin, pêjîna xwarina “Tiştîn”ê, govend û semayên îrfanî, parve kirina gûzên di baxê Pîr Şalyar de, merasîma “Kilaw rojne”, qûrbanî kirina jalan, şevnîşînî, nimêj û dua, dest gerandin bi dola Pîr Şalyar anku dîdara kewşa çermî yê Pîr Şalyar û pêjîna “Kulêre Mejge”yê di nava xelkî de ta sê roj û 3 şevan birêve diçin. Zarok beyaniyên roja çarşemê di girupên sê kesî û çar kesî de “Killaw Rojne”yê destpê dikin ta saet 9 û dûre qûrbanîkirina ajalan destpê dike, êvara roja pêncşemê bi govend, zikirên îrfanî û ta danî beyanî ya roja înê didome, dûre diçin ser gorra Pîr Şalyar û merasîma dua xwendinê birêve diçe.

Hin jêderka vê ahengê vedigerînin daweta zewaca Pîr Şalyar û Behar xanima Şahzadeyê Buxarayê ku Kurdên Hewramî her sal bo bîranîn û pîrozkirina wê, aheng, stran, hûzan(şîîr), govend, def jenîn, sirût û gotinên olî vê cejnê pîroz dikin û bi bîrtînin. Helbet di wê demê de di nav Zerdeştiyan jî du cejn birêve diçin bi navê cejna “Mîgregan” û cejna “Tîregan”ê.

**Erdnîgariya Hewramanê**:
Hewraman dikeve navenda Kurdistana mezin û herêmeke çiyayî ye. Piştî çar parçe kirina Kurdistanê û van dewletên çêkirî, herêma Hewramanê paja her du parçeyên Îran û Îraqê bû, ji parçeya rojhilat anku îranê re “Hewramana Text” û ji parçeya başûr anku îraqê “Hewramana Sext” tê gotin. Cihekî geştyarî û xwezayî ye, gund, xanî û xwezaya wê taybet e û piranî gundên Hewramanê dikevin qet û kêla çiyan, baniya mala jêrin dibe hewşa mala jorîn û tevne bi kevirên çiyan hatine çêkirin û ti çîmento û lavên avahsaziyê têde nehatine bikaranîn. Herêma Hewramanê dikeve orta bajarên Helebce, Pawe, nesû û Merîwanê. Gundê Hewramna Text girêdayî bajarê “Sewlawe”yê ye, li gor rîwayetan ew der cihê zadbûna Pîr Şalyar û gorra wî jî her li wir e. Herêma Hewramnê û Hewraman Text li Yunskoyê weku ciheke kevnar û geştyariyê hate tomarkirin.

**Cejna Pîr Şalyar û çanda Hewramanê**:
Peyva Hewramanê ji du pajên “hûra” anku “ahûra” û “man”ê anku der, mal, welat pêktê, anku welatê ahûrayî û welatê pîroz û welatê rojê. *Hûr yan xûr û xor anku roj û tav*. Xelkên Hewramanê bi diyalekta Hewramî dipeyvin. Hin ji dîroknasan dîroka vê cejnê vedigerînin hezar sal berê û hinek din jî vedigerînin zêdetirî hezar sal berê. Birêveçûna vê ahenga bi rûmet a civaka Kurdî û dilsoziyên civakê bo çalakiyên çandî, amajeya entelktualî, kenvarî û şaristaniya vê erdnîgarî û çanda vê civakê şan dide. Di vir de baştir xuya dibe ku peyva “Pîr” bê sedem neketiye nava rêbaza sofîgeriyê û ev asta Pîrîtiyê asta serfiraziya rêwîtiyeke dûr û kûr a rewşenî û ronahiyê ye.

Ronahiya Mîtra û eşq, ronahiya dûrketin ji nefamî û nezaniyê. Ew xwedî pêgeh û wateyeke kûr a Kurdistan û Zagrosê ye. Peyva “Pîr”ê hêmaya pakî, ronî, û behayî ya xwezaperwerî û xwedaperestî ye. Ew di zihn û ruh û çanda Kurd û Hewramiyan de dijî. Hewraman xwedî, hûner, kinc, xwarin, mûzîk, fikir, bawerî, çandên taybet in. Mêrên wê rank û çoxe, mişkî, ferencî û jinan jî canî, kullince, şal û şeddeyên rengal dipoşin.

**Pîr Şalyar di mijara Mîtrayî de**:
Bîr û baweriya Mêhr û Mîtrayî weku kevintirîn ol û jêderk û santrala hemû olên din ên Kurdî ji ruh û warê Kurdî û Zagrosê derket û belava dunyayê bûye. Pîr dûmayiya baweriya Mîtrayî ye û ji dînê belava dînên din ên Kurdî bûye. Di baweriya Mîtrayî de Pîr di balatirîn ast û pêgeh de ye û nûnerê Mîtrayê ye ligel wî jî “Baba-Bawe” jî heman rêberên dînî ne. Zagros navend û çexa Mîtrayê ye. eger em berê xwe bidin çiya û der û memleketên cuda cuda yên Kurdistana mezin, der nîne ku navê Pîr pêve nebe yan jî pîrek li wir nebûbe û nejiyabe, ha ji pîran, pîremegrûn, pîranşehr, pîrdawud, pîrmam, pîrweys yd.. Boneya Pîr Şalyar weku cejneke mîlî û Kurdwarî reh û koka wê kûr û dûr e, zor giring e beyexên zêdetir jêre bê dayin. Koka sofîgeriya Pîr Şalyar û pîrên pey xwe ta çaxa pîrên Loristanê û pîrên Hewramanê li seranserê Kurdistana mezin, eger çi hin cudahî jî hebin lê dîsan tevan vedigerin yek çavkanî û yek baweriyê ku ew jî di koka xwe de fikir û felsefeya Mîtrayî anku xwezaperweriyê ye.

Lêkolîn û nivîsîn: Qendîl Şeyxbizînî
29.7.2021